

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

PAYÎZ/2008

"Panzde salî bûm çûm ser hewîyê"

Îbnî Xelikan û Bermekîyan

1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi karşısındaki tutumu ve 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni

39

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 39, payiz 2008

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen
M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanyaya

Tfn: 0049-(0)172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 258/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanyaya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127



*Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.
Mafe redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li
xwedîyan nayên vegerandin.*

*Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.*

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB



Wêneya li berga pêşîn:
Baxçê Eysê û gündê Bêşqewaxê
Foto: A. Tigrîs



- 2 Ji Bîrnebûnê, *Alî Çiftçî*
- 4 Li Danmarkê kursa zimanê kurdî, *Amed Tîgrîs*
- 6 Apec û Spîrêz di fûara pirtûkan a Goteborgê de, *Amed Tîgrîs*
- 8 Îbn Xelîkan û Bermekîyan, *Nuh Ateş*
- 14 Mîrê Botan û Mîrê Behdînan, *Jordan*
- 15 Cîgerxwîn, *Mem Xelikan*
- 20 Mezelê Susizê, *Red*
- 21 Li ser cemedê jîyanek, *Uskê Cimik*
- 27 Qenere, *Seyfî Dogan*
- 30 Bi zaravê Xelikan, ÇAV, *Nuha Ateş*
- 33 "Panzde salî bûm çûm ser hewîyê", *Altun Başaran*
- 35 Zimanên kolonîyalî hîn fermî ne, *Nuh Ateş*
- 37 Şevereşên sêwî, *Xîzan Şîlan*
- 39 Çarmêxa Îsa, *Hamîte Hinare*
- 40 Li Swêdê bi îstatîstîkên nû perwerdeya kurdî û şiroveyeke giştî
- 44 1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi, *S. Ghalib*
- 50 Türk – Kürt Ulusal Paktı
- 54 İki Belge
- 57 Koçgiri Ayaklanması üzerine bir özet
- 60 Lozan Konferansı'na Doğru
- 64 Sonuç
- 67 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni

Perwerdeya bi zimanê kurdî pêwîstiyeka jiyana rojane ye

Di van rojên payîzê de, dîsan guh û çavên dinyayê li ser kurd û Kurdistanê ye!...

Em bixwazin an na, bi dilê me be, an na, bi ci awayî dibe bila bibe, çênabe ku em wek kurd di aktualîteya rewşa mîletê xwe de, bêdeng, bêhêvî û bêdaxwaz bin!

Belê, piştî hewqes qurbanî û fedekarî, hê jî xelkê me yê bakur bêmaf e û di warê kesayetiya xwe de jî bêxwedî, li ser axa xwe wek pêner dijî.

Mîletek wek me kurdan, ku ji pir aliyan ve xwedî kewneşopiyeka dewlemend e û hê jî li ser axa xwe bê xwedîdewlet e, tune! Ne tene bêdewlet bûn, di wê dema ku di her aliyê pêşketiyên teknikîyên agahdariyê de jî em wek kurd hê nikarin bi zimanê xwe zarokên xwe perwerde bikin!

Zimanê ku di perwerdeyê û hînbûnê de neyê bikaranîn di pir aliyan de lawaz dimîne. Peyder pey li pey zimanên din dikeve û ber bi windabûnê ve diçe! Îro rewşa zimanê me jî di proseseka wiha de ye.

Di van rojan de li seranserê Kurdistanê bakûr û li Tirkîyê daxweza perwerdeya bi zimanê kurdî tê kirin. Ji bajarên Kurdistanê bi hezaran însan bo

mafê xwe yê herî bingeîn, meşîyan. Ew herçiqas pir bi derengî ketibe jî bi ya min daxwazeka pir di cîh de ye û divê ne tenê bibe aleteka propagandaya hêzên siyasî!... Lê divê ev daxwaz bibe daxwaza pêwîstiyeka jiyana rojane.

Ew daxwez ji aliyê her kurdekî û herwiha ew kesên ku dibênin em mafê însanan diparêzin û demokrat in ve divê bêt piştawî kirin! Ji ber ku ew mafê her însanekî ye û pir tabî ye!..

Kengê însanên me bi daxwezên bo mafên xwe yê pir tabî ve derketine meydanan, dewleta tirkan her bi darê zorê bersiva xelkê me daye!..

Balkêş e, di van rojana de li hember van daxwezên mefê perwerdeya bi zimanê kurdî tê kirin, rêvebirên Tirkîyê her dîsan dixwazin bi şer bersivê bidin û haziriya şer dikin.

Dema hîlbijartin nêzik dibin tu dibînî ew partiyên tirkan bi her awayî xelkê me, bi rêya baweriya dînî be an jî ji aliyê aboriyê ve be, dixapînin, dibênin; *em birayê hev in, em giştik misilman in, qedera me bi hev re ye*. Bi dengên wan tên ser hukum û piştî jî wan gotinên xwe yê berî hîlbijartinan her di cîh de ji bîr dikin.

Nimûnên wiha hertim di dema hil-

bajartinan de dubare dibin! Ev ji dema dewleta Osmanî vir ve her wiha bûye!... Pir mixabim, di dema niha de jî xelkê me bi polîtîkayên wiha hêjî tê xapandin!...

Belê, girîngiya perwerdeya bi zimanê kurdî; em di van salên dawîn de dibînin ku di nav ciwanên me de hişjariyek dest pê kiriye. Li koka xwe, li zimanê xwe xwedî derdikevin. Li welêt xwendekarên universîteyan ji bo perwerdeya bi zimanê kurdî, civînan li dar dixin û di nav xwe de kursên zimanê kurdî organize dikin. Nimûneyeka weha ya hişyarî û xwedî li keseyatiya xwe derketin, li derveyî welet li Danîmarkayê bi kurseka du hefteyî, ji aliyê xwendekarên kurdên li Danîmarkayê destpê kir. Xebera vê kursê bi sernivîsa *Li Danîmarkê kursa zimanê kurdî* di vê hejmarê de hatiye weşandin.

Birêz Nuh Ateş bi sernivîsa *Îbnî Xelîkan û Bermekîyan* nasnameya Bermekîyan bi me dide nasîn. Di vê nivîsa balkêş de jî li ber çavan e ku dema mîletek bêdewlet be, jêhatiyên vî mîletî çawa li ser hinekên din tên hesabandin.

Bi sernivîsa *"Panzde salî bûm çûm ser hewîyê"* Altun Başaranê sohbetek bi du jinepîrên ji gundê Altilera û Omera re kiriye. Sohbeteka pir balkêş e. Ev mesela hewîtiyê di civata me de çing

dibûye û jin vê meselê çing jiyane, bi zimanekî xweş bo me diyar dike.

Bi sernivîsa *Qenere*, birêz Seyfî Dogan aliyekê ciwata me ya gundîtiyê ya din bi zaravayê xelika bo me dide nasandin. Di vê kurtenivîsê de dema bahsa şiwantiyê û hekatên wê demê tên kirin em rastî bi dehan gotinên kurdîyên ku li ber windabûnê ne, rast tên. Bi xêra vê nivîsê bi kêmasî deh kelîmeyên ku li ber windabûyîné ne hatine berhevkirin.

Ji ber aktualîteya mijarê, em gotareka ku ji aliyê Sabah Ghalîb ku di 2005 û 2006 an li unîversîta Silêmanyê û Koyê bi kurdî hatiye dayîn, bi wergera birêz Agit Khorshid Zaher, bi sernivîsa *1919-1923 yılları arasında Mustafa Kemal Atatürk'ün Kürt Meselesi karşısındaki tutumu ve 1922 tarihli Kürt Otonomisi Kanununun Metni* di vê hejmarê de bi tirkî diweşînin.

Gotar û belgeameyeka bo me kurdan pir girîng e! Divê her însanê me vê belgeameyê bixwîne û pê bizane ku Mustefa Kemal Atatürk di destpêka avakirina Tirkiyê de kurd çawa bi kar anîne û înkariya kurda çing bûye îdeolojiya resmî ya dewleta tirka ku hêjî li hember kurdan tê bikaranîn!

Heta hejmarê bê, bimînî di xêr û xweşiyê de!

Ali Ciftci

Li Danîmarkê kursa zimanê kurdî

Amed Tigrîs

Komela Xwendekar û Akademîsyenên Kurd li Danîmarkê bi hevkarîya weşanxaneyê Apecê di roja 11ê tebaxê de li bajarê Kopenhagê kursa hînbûn û hînkirina zimanê kurdî vekir ku ez mamostetiya wê bikim. Kursê heta 19ê mehê dom kir. 18 xwendekar beşdarên kursê bûn û piraniya beşdarên xwendekarên zanîngehê an jî zanîngeh qedandibûn.

Giraniya kursa li Danîmarkayê li ser xwendin û nivîsandina kurdî bû. Ji ber ku hemû xwendekar bi kurdiya devkî dizanibûn. Di nav xwendekarên de ji her aliyê Kurdistanê xwendekar hebûn lê bi piranî kurdên ji Anatoliya Navîn bûn.

Kursa zimanê kurdî gelek bala kurdên li Danîmarkê kişand û loma çend dem û dezgehên kurdên li Danîmarkê daxwaz dikin ku di rojên pêş de ji bo endamên xwe kursên bi vî rengî vekin. Herweha ne tenê li Danîmarkê li gelek welat û bajarên Ewropayê kurd dixwazin beşdarî kursên zimanê kurdî bibin û ji dem û dezgehên xwe dixwazin ku li bajarên wan jî kursên kurdî dest pê bikin.

Komela Xwendekar û Akademîsyenên Kurd li Danîmarkê û Weşanxaneyê Apecê li Swêdê hewl didin ku di rojên pêş de, bi vî cureyî li seranserê

Ewropayê kursên zimanê kurdî vekin. Wek dibistaneke seyar li welat û bajarên Ewropayê çerx bibin û bigerin.

Dîtinên xwendekaran

Di dawiya kursê de çend xwendekaran di derbareyê kursê de hest û ramanên xwe weha anînên zimên:

Necatî: Min ji kursê gelek fêde dît. Berî hefteyek ez nikaribûm bi kurdî bixwînim. Niha piştî hefteyekê ez êdî bê problem dixwînim û dinivîsînim. Kêm be jî ez gramer û rastnivîsîna kurdî hîn bûm. Min heta îro di civînan de bi tirkî deng dikir, êdî ez bi kurdî deng dikim. Li cem min gelek pirtûkên kurdî hene, lê mixabin min nikaribû ez bixwînim. Min dest pê kiriye û êdî ez ê yek bi yek bixwînim. Ka de werin li vê ecêbe binêrin, em bi çend zimanên xerîb dizanin lê bi zimanê xwe nizanin. Ev kurs ji bo me destpêk bû, em ê hîn çend kursên weng vekin.

Mehtab: Heta berî vê kursê min nikaribû ez bixwînim. Dema ez alfabeya kurdî hîn bûm, êdî bi hêsanî şe dikim bixwînim û binivîsim. Bi xwendin û nivîsandina kurdî re em gelek tiştên din jî hîn bûn. Wek nimûne em rojê 15-20 term û peyvên kudî yên ku di



Dîmenek ji kursa zimanê kurdî li Danmarkê

zimanê dengkirinê de kê mên bi karanîn an jî nayên bikaranîn em hîn bûn. Ez êdi dikarim bi kurdî pirtûkan bixwînim û xwe bi pêş bixim.

Eyupxan: Ez bi xwe mamoste me û ji bajarê Amedê me, lê heta niha min nikaribû ez bixwînim û binivîsînim. Min di vê kursê de kilîta xwendin û nivîsandina kurdî fêhm kir. Alfabe û bingehê gramerê fêhm bûm. Ez ji vir bi şûn de xwe bi xwe bi pêş dixim. Min vê havînê ji Amedê çend pirtûkên çirokan kirin ku ji keça xwe re bixwînim, lê zehmet bû. Niha ez ê her êvar wan çirokan ji keça xwe re bixwînim. Ez li vir mamostetiya zimanê tirkî jî dikim. Ez ê hewl bidim ku ji vir şûn de mamostetiya zimanê kurdî bikim. Çima na?!

Özgür: Ez ji wek hevalên din min

bi kurdiya dengkirinê dizanibû, lê min şê nedikir ku bixwînim û binivîsînim. Êdî ez dixwînim û dinivîsînim. Lê ev kurs têrî min nekir divê çend hefteyên din jî hebûya baştir dibû. Min ji vê kursê pir fêde dît.

Xezal: Erê ez jî ho bûm, dixwînim û dinivîsînim. Berê Ap El ji min re pirtûkên kurdî tanî, min şê nedikir bixwînim. Li mala me pirtûkên min pir in. Min li fotografan mezê dikir. Ez êdi dikarim bixwînim û binivîsînim. Ez ê nivîsên li bin fotografan jî bixwînim¹.

1 (*) Xezal herî biçûk û gula kursê bû. Ew 14 salî bû bi xwendekarên unîversîte re dihat kursê. Ji gelean baştir û rastir dixwend û dinivîsand. Ji bo helwest û hewesa wê me pirtûka "Xuşka min li ku ye" diyarî da wê.

Apec û Spîrêz

di Fuara Pirtûkan a Göteborgê de

Amed Tigrîs

Fuara Pirtûkan a Göteborgê di 24 mehê de deriyê xwe ji pirtûkfiroş, pirtûk-kirox, nivîskar, hunermend, muzîsyen, semînerdar û mêvanan re vekir. Îsal 24.emin a Fuara Pirtûkan a Göteborgê ye. Wek dewlet hevkar û beşdarên Fuara Pirtûkan a Göteborgê li gel dewleta Swêdê ev dewlet jî hene û cihên xwe vekirine: Almanya, Avustraliya, Avusturya, Bulgaristan, Çîn, Danîmark, DYA, Finlandiya, Fransa, Hîndistan, Holland, Îngilistan, Îrlanda, Îskoçya, Îsland, Îsrail, Kanada, Letonya, Lîtawiya, Lubnan, Misir, Nîjerya, Nîkaragûa,

Norvej, Polonya, Portekîz, Romanya, Sîriya Leon, Swîsre û Ukrayna

Her sal welatek dibe Fokusa Fuara Pirtûkan a Göteborgê. Îsal jî welatê ku fokus li ser e, Letonya ye. Serekwezîrê Letonayayê Invars Godmanîs bi şandekê mezin ku bi dehan sîyasetmedar, weşanger, rojnamevan, nivîskar, hunermend û muzîsyen di nav de bûn beşdarî fuarê bû û di fuarê de axivî. Afîş, nivîsar, semîner û hemû alavên masmediyayê li ser welatê fokus e: ji her aliyê ve dîrok, wêje, ziman û çanda Letonayayê tê nasandin.

Bernabeya Fuara Pirtûkan a Göteborgê





îsal gelek dewlemend bû. 435 semîner hat dayîn. Ji 30 welatan 800 semînerdar beşdar bûn. Guhertin û nûbûneke sala îsal ev e ku mirov roja yekşemê dikare bi bilêta xwe bêpere semîneran guhdarî û temaşe bike. Heta niha beşdarbûna semînerên mezin û pilebilind bi pere bû. Ji derî van semînerên mezin û pilebilind li gelek salonan semîner, konser û civîn hene ku berê bêpere bûn û niha jî bêpere ne.

Di bernameya îsalîn de balkêşiyêke din jî ev bû ku Letonya, Romanya û welatên cîran bi hevkarîyêkê Muzexaneyê Dunyayê ava kirin.

Di Fuara Pirtûkana Göteborgê de du weşanxaneyên kurdî jî beşdar bûn. Ji Duhokê weşanxaneya Spîrêz û ji Stockholmê jî Weşanxaneya Apecê. Ev du sal in ku Spîrêz û Apec li gel hev li yek cihekî pêşangehê vedikin. Di pêşangehê

de nivîskar Hesenê Metê, weşanger Ahmed Mîlan û helbestvan Selwa Gulî û gelek kurdên devera Göteborgê serdana cihê APEC & SPÎRÊZê kirin, li montera wan sohebtên cûr be cûr li gel Xwedî û berpîrsê Spîrêzê Mueyed Teyîb û yê Apecê Alî Çiftî kirin.

Di Fuara Göteborgê de pirtûka Ingmar Karlsson a bi navê *"Kurdistan landet som icke är"* aktuel e û balê dikşîne. Roja pêncşemê Ingmar Karlsson bi xwe pêşengeha Apec û Spîrêzê zîyaret kir û demke kurt bi berpîrsên weşanxaneyên kurdî û nivîskarên kurd re sohbet kir.

Îsal 949 fîrma û weşanxane li fuarê cih vekirine. Roja pêncşemê 21144 kesan zîyaret kirin û roja îne ev hejmar derket 49 976. Diyar dibe ku roja şemî û yekşemiyê dê ev hejmara beşdaran zêdetir be.

ÎBNÎ XELIKAN Û BERMEKÎYAN

Nasnameya Bermekîyan

Nuh Ateş

Gava ku meriv navê xelikan (khallikan) û bermekîyan (barmakiden) dide gogolê û pişkoja lêgerê çirt dike, bi dehan nivîs tên ber wî. Meriv bi vê têdîgihê ku van herdu navan li ba miletên din û di ber gîştan jî li ba elîtên wan giran û nas in.

Çima van navên hana di qada navnetewî da nas û bi rûmet in?

Navê xelikan jî avûrûyên bîyografvanê bi nav û deng, Lawê Xelikan (Îbnî Xelikan) nas û navdar e. Navê bermekîyan jî di saya malbata bermekîyan ya ku di dema xelîfetîya ebbasîyan da wezîrtî kiriye bi şan û şohret e.

Lê tiştê di vir da bi bed ew e ku di piraniya çavkanîyên dervayî da Lawê Xelikan wekî zana û bîyografvanê bi eslê xwe ereb û malbata bermekîyan jî wekî faris tên zanîn û nasandin (wîkîpedîa: Îbn Khallikan û Barmakiden). Va jî ji xêrneditîya kurmancan û hesudîya neyarên wan tê. Kurmanc bê dewlet in û lewma her çêşid heyî û hêjayîyên wan bi ser xelkê da tên berdan û li wan tên mahrkirin.

Lawê Xelikan (1211-1282)

Lawê Xelikan li Hewlêrê hatiye dunyayê. Nav li ser e, ew î ji eşîra Xelikan e (Mehrdad R. Îzady, *Kürtler*, weşanên Doz, r. 158). Îbnî Xelikan navê wî yê kurt e. Di nivîsa li ser Îbnî Khallikan ya di wîkîpedîayê da navê wî yê dirêj wer hatiyê nivîsîn: Ahmed b. Muhammed b. Îbrahîm Abul Abbas Şamsedîn al-Barmakî al-Îrbîlî al-Şafihî. Lawê Xelikan di esera xwe ya li ser navê "*Wafayet al-ayan wa-anba abna az-aman*" (jîniya kesên meşhur û haydarîyên li ser lawên zemanê xwe) jîniya 900 kesî nivîsîye. Hêjayîya kar û eserên wî mela xelkê û di ber gîştkan jî ya derûdorên zanîyar û akademîkar kişandîye û dikşîne. Nimûne, dersdarê Unîversîteya Berlînê, Gerhard Wedel di salên 2002-2004 an da bi profesora oryantalîsmê, Dr. Renate Jacobî va tevhev projeyek li ser kar û eserên Lawê Xelikan çêkirine (<http://web.fu.berlin.de>).

Şayanî gotinê ye ku Lawê Xelikan ji xêyrî karê nivîsîna bîyografya li Şamê û Misirê qaditî û serqaditî kiriye.

Di çavkanîyên kurmancan bi xwe da Lawê Xelikan ron û aşkere wekî kur-manc tê nasandin û navê wî di nav kur-mancên zana û navdar yê ku bi erebî nivîsîne da tê heldan (M. Emîn Zekî, *Kurdistan Tarihi*, weşana beybûn, r. 159, û M. R. Îzady, e. ç, r. 97).

M. Emîn Narozi ji esera Lawê Xelikan beşa li ser Selaheddîn Eyyubî ji erebî wergerandiye kurmançî û weşanxaneyê Avesta ji ew wekî kitab weşandiye. Di pêşgotina xwe da Narozi qala gundekî Hewlerê yê nêzikî Herîrê û bi navê Xelekan dike. C. Rojbeyanî gundê Xelekan li gelîyê Xelekan û nêzikî Koysançaxê bi cih dike (Şerefxan Bedlîsî, *Şerefname*, weşanên Apec, jêrenot 194, r. 480).

Li gorê pêşgotina Narozi Lawê Xelikan bixwe kokê xwe digihîne bermekîyan.

Dr. Ebdulmecît Şexo di lêkolîneke xwe da navê Lawê Xelikan, wekî Ehmed Lawê Mihemed Lawê Ibrahîm Lawê Bekir Lawê Xelekan heldide û ji Lawê Xelikan neqil dike dibê "bermekî ji êla zerariya kurdî ye, ew nasdar-tirîn êl ji bermekîyan bû" û pê da dihe-re dibê, "Xelidê bermekî bavpîrê bav-pîrên Lawê Xelekan e" (Dr. E. Şexo, di dîrokê da bi gelemperî pêwendiyên kurd û ereban 2: www.rojava.net.)

Ma va çing dibe, Lawê Xelikan xelikanî yan bermekîyanî (zerzarîyayî) ye?

Yan jî bermekîyan / zerzarîyayî bi xelikan va çî ye hevdûdu dikan, xisimî û mermalîtiya wan xas heye?

Nêzikbûyînek di navbera wan da heye, lê detayên wê nayên zanîn. Ji van dîtînan û haydarîyan û ji navlêkirina Lawê Xelikan meriv dikane derbixe ku Lawê Xelikan him xelikanî û him jî bermekîyanî ye. Meriv dikane vê wekî gumaneke nêzikî rastîyê bihesibîne.

Kî dizane, dibe ku malbat yan qebîleke bermekî ji eşîra zerariya ji ber sedemên ku em pê nizanin veqetî û teve xelikanîyan bûbûye!

Li derên din çing e nizanîm, li ba kurmançên nava Anatolîyê îro jî piraniya gund û qesebayên wan bi navê eşîrê tînan binavkirin û nasîn. Nişteciyên gund û qesebayan di nav xwe da hevûdu bi navê qebîle yan malbata xwe û lê li dervayî gund û qesebayê bi navê eşîrê binav dikan yan didin nasîn. Li gorê vê, Lawê Xelikan xelikanî û ji qebîleya bermekîyanî ye. Lê va jî, çiqas nêzikî aqila be jî wekî gumaneke dimîne.

Pêzanîyên di dest da tînan nakin ku em bersiveke zelal bidin pirsên di derbarê mijara pêwendiyên xelikanîyan û bermekîyan û nasnameya Lawê Xelikan ya eşîrtî û qebîletî.

Di cihê xwe da ye ku li wir kurt çend malumat li ser xelikan bînan pêşkêşkirin. Li gorê haydarîyên

aşkere eşîra xelikan li cografyake fereh bi cih û war e. Nimûne, meriv li Îran (Kirmanşah, Maku), Xorasan, Turkmenistan, Ermenîstan û Tirkîyê (Wan, Beyazîd, Semsur, Konya) rastî kom û komikên vê eşîrê tê (Îzady, r. 160 û Celîlê Celîl, *XIX. Yüzyil Osmanli İmparatorlugunda Kürtler*, weşanên ozge, r. 28 û Üskê Cimik, *Xelikan Tarihî*: www.xelkedondurme.com, beşa dîrok). Îzady kokê Xelikan digihîne keldanî û haldaniyên antîk û wer dibê: "li gorê qeyidên kevn yên ku hebûna xelikan nîşan didin, herêma navberê bakûrê gola Wanê û Erzîrumê wekî cih û warê wan tê heldan. Xelkanî neviyên keldanî / haldaniyan ne û di serdemên antîk da li dora gola Wanê berek ji yekîtîya xelkên hurî bûn" (Îzady, e.ç. r. 157, 161).

Ma bermekîyan kî ne?

Di wîkîpedîa da li ser bermekîyan wer tê gotin: "malbateke faris e ku di dema ebbasîyan da serdarê dewletê bû. Ew ê berê zerdeştî bûye (li gorê çavkanîyekê budîst bûye) û ji Belxê ye û di pêy zeptkirina rojavaya Îranê vegeyîye ser dîne îslamê."

Belx îro bajarekî Efganîstanê ye, lê berê bi ser Xoresanê va bû. Xoresan berê herêmeke mezin bû û bajarên wekî Semerkand, Buhara (Ozbekistan), Herat, Gaznî, Qebul (Efganistan), Meşed, Tus, Nişpur (Îran) û Merw

(Turkmenistan) jî bi ser erdê wê va bûn. (wikipedia: Choresan)

Ji serdemên kevn pê va kurmanc û bav û kalên wan li Xoresanê jiyane û dijîn. Li gorê Îzady îro nifusa kurmancên Xoresanê 2 milyon in (M.R. Îzady, e.ç. r. 38 û Şoreş Reşî, *Reşîyanlar û Canbeg-Kolik-Xoresan*: www.xelkedondurme.com. beşa dîrok)

Ferhenga Meyers Grose Konversations - Lexikon jî bermekîyan weng dide nasîn: "paşmayîyên barmakê hêkîm û rehîbê ji Belxê ne. Malbateke faris e û di bin hukumdarîya ebbasîyan da meqamekî bilind bi dest xistiye. Xalîdê lawê Barmak di dewra herdu xelîfeyên ebbasî yên pêşîyê da nêzikî textê hukumdarîyê bû. Lawê wî Yehya mamosteyê Harûn Reşîd bû û di dema xelîfetîya wî da wezîrtî kiriye." (www.zeno.org/Meyers-1905/A/Barmekiden)

Şerefxan Bedlîsî di Şerefnameya xwe da qala bermekîyan dîke û kokê mîrên eşîra suwêdî (sewêdî) digihîne bermekîyan û kokê bermekîyan jî digihîne melîkên farisan û binemala eşîra suwêdî jî digihîne ereban. Li gorê haydarîyên ku Şerefxan dide, bermekîyan wezîrtî û serwezîrtîya xelîfeyên emewî û ebbasîyan kiriye. (Şerefxan Bedlîsî, e.ç. r.276-284)

C. Rojbeyanî di derheqa serhatîya bermekîyan da haydarîyên tenekî ji vê

cihê dide: "Ji Turkîstanê bi leşkerên dijî emewîyan re hatin Îraqê û ji bo demezrandina dewleta ebbasî gelek tekoşîn. Çar kes ji wan gelek bi nav û deng bûn:

1) Xalid: Bi Ebû Muslîm ra hat Îraqê û bû wezîrê Ebbasê xwînrij.

2) Yehyayê Kurê Xalid: Ebû Cehferê Mensur Azerbaycan daye û Mehdî kir wezîr.

3) Fedlê Kurê Yehya: Di dema Harûn Reşîd de bû wezîr.

4) Cehferê Kurê Yehya: Wezîrê Harûn Reşîd bû. Di dema Cehfer de fermana qira bermekîyan derket". (Şerefxan Bedlîsî, e.ç. jêrenot 350, r. 499) Li gorê vê bermekîyan 50 salî zêdetir wezîrtî kiriye.

Lê Dr. Ebdulmecît Şexo dibê, bermekîyan dema ebbasîyan 17 salan desthilatdarî kiriye. Gerek e bê gotin ku hinek malumatên di van çavkanîyan da ji hinek cihêtan da li hev nayên.

Tê gotin ku di dema xelîfetîya emewîyan nêzikî dawîyê bûbû da, li Xorasanê femandarekî emewîyan bi navê Azad yê ku di bin femandarîya walîyê Îraqê da bû, navanda textê serdarîyê ji paytexta Xorasanê, Merwê kişandiye Belxê. Wî xwaztîye ku bajarê Belxê îmar û nûva bike û Dîhqan Barmak kiriye serdarê vî karî (Jûlius Wellhausen, Das Arabische Reich und Sein Sturz, r. 29). Bi vê jî meriv têdigi-

hê ku malbata bermekîyan li Belxê jî di karê îmar û îdareyê da jîr û jêhatî bûye. Ev Dîhqan Barmakê ku Wellhausen qalê dike, bavê Xalîdê Bermekî ye. Li gorê vê çavkanîyê, Dîhqan Barmak ji "Neubahar"ê ye. "Neubahar" (Nubahar) dibe ku Buhara be.

Dîhqan leqeb e û tê meneya esîlzade û êhtimal heye ku koka wê digihê gotina "dehkanan" ya partî / farisî.

Ji çavkanîyan dertê ku bermekîyan wekî malbateke esilzade di serdema part û sasanîyan da jî xwedîyê leqeb û meqam û tecrubeyên sazûmankarîyê bûne. Li ba sasanîyan çar leqeb ji bo rêzên esilzadeyan hebûn. Rêza pêşî a serdaran (qiral) bû. Di pey va bi dorê vazpûran, vuzurgan û azadan dihatin. Çavkanîyên ereban rêzek din ya bi navê dehkanan heldidin. Dehkanan leqebê dewlemend û serdarên herêmên piçûk mîna gundan bûye. (Josef Wiesenhöfer, Das Antike Persien, r. 191, 231)

Dawîya wezîrtîya Bermekîyan

Ebbasîyan (750-1058) di saye serheldana di bin serkêşîya Ebû Muslim Xoresanî da textê xelîfetîyê ji dest emewîyan girtin. Piştbazên serheldana Ebû Muslîm pîranî îranî û xoresanî bûn. Yê ku li dijî zilm û neheqîyan û dijî zordarîya emewîyan û bi zorê islamkirinê derdiketin li dora Ebû Muslim kom bûbûn. Cîgerxwîn

serheldana Ebû Muslîm wekî şoreş û destpêkîya fermanariya kurmancan bi nav dike.

Ebû Muslîm Xoresanî jî kurmanc e. Mêrxas û sazûmanzanekî li ser xwe bûye. (M. E. Zekî, e.ç. r. 60 û Cîgerxwîn, *Tarîxa Kurdistan I*, weşanên Roja nû, r. 140) Lê di çavkanîyên dervayî da navê wî wekî egîtekî faris î netewî derbas dibe. Di dewra ebbasîyan da, di qada serdariyê da para îranîyan (faris, kurmanc û yên din) ne piçûk bû. Ebû Muslîm bû hukumdarê Xoresan û rojavaya Îranê, lê pir neçû bi destê xelîfeyê ebbasî hate kûjtin.

Sazûman û tevgêrzanîya Bermekîyan jî rewayî gotinê ye. Bermekîyan ji destpêka dema xelîfetîya ebbasîyan pê va bi dehan salan li ser textê wezîrtîyê rûniştin. Dema wezîrtîya wan dema dewleta ebbasîyan ronaktir bû. Avadanî, zanîstî, huner û wêje pir pêşketî bûn.

Her ku zeman rabirtîye bermekyan jî bare xwe dagirtîye û pir bi hêz û dewlemend bûne. Tê gotin ku wan êdî xwe di ser Harun Reşîd ra didîtîne. Mal û milkê wan weqas pir bûye ku nedihatîye hesabkirin. Hukmê wan di nava dewletê da, bi taybetî di qada desketî û xercîyên xezîne da her çûye zêde bûye. Ji rûyê vê da xêrnexwaz, hesud û neyarên wan jî pir bûne û wan Xelîfê Harun Reşîd sor kirine û berdane bermekîyan. Sewa vê, Harûn Reşîd yê ku

li ber destê Yehyayê Bermekî mezin û şîret bûye û şîrê Jina Yehya mêtîye, lawê Yehya û şîrbirayê xwe, Cehfer daye kujtin û bav û birayên wî jî avêtîne zîndanê (Ş. Bedlîsî, e.ç. r. 277,278 û Dr. E. Şexo, e.ç.)

Tarîxzanê ereb Îbnî Xaldun jî kûjtinê Cehfer û zîndankirina bav û birayên wî bi zêdebûna qudret û nifûza bermekîyan va girêdide. Li gorê rîwayetekê jî dilketî hev bûna Cehferê bermekî bi xwanga Harun Reşîd, Abbasayê va bûye sebeba kûjtin û perîşankirina bermekîyan. Tarîxzanê faris Tabarî qala vê rîwayetê kiriye û li ser vê belav bûye. Abbase xwanga Harun Reşîd ya ji bavê da bû. Dîya wê îranî bû. Harûn Reşîd bi zewaca wan razî nebûye û nehîştîye ku ew bigihên mirazê xwe. Lê Abbasa û Cehfer bi dizîkî mîna jin û mêrê hev jiyane û cewîyên wan (du law) bûne. Wexta ku Harun Reşîd va bîhistîye ji rê derketîye, berê Cehfer daye kujtin û bav û birayê wî jî avêtîne zîndanê, paşê xwanga xwe û her dû lawên wê dane kujtin.

Dilketîya Abbasa û Cehfer di serdema me da bûye mijara lîteraturra Ewropayê, romana frensî bi navê "Abbasa" (1753) ya Aîme Gîron û "Les nuits de Bagdat" (1904) ya Albert Tozza ([http:// de. Wikipedia.org/wiki/ Abbasa](http://de.wikipedia.org/wiki/Abbasa), [www. û www.jadu.de/mittelalter/index.html](http://www.jadu.de/mittelalter/index.html), das Abbasidenkalifat; Harun Al – Raschid).

Nasnameya Bermekîyan

Ma dîtîn û îdîayên di çavkanîyên der-
vayî da yên ku bermekîyan bi nasna-
meya etnîyî wekî faris didin nasîn çiqas
rast in? Li vir taybetiya bi ber çavan di-
keve ew e ku kesên dîtîn û îdîayên han
pêşkêş dikin, ji boyî vê tu çavkanîy-
an helnadin û tu delîlan nanimînin.
Lewma jî bi ya min meriv dikane dîtîn
û gotinên wan wekî gumanên sist û ji
rastîyê dûr bi nav bike.

Cihê bibîranî ye ku Lawê Xelikan
bixwe kokê xwe digîhîne bermekîyan.
Ji ber vê, eger em bermekîyan wekî fa-
ris bihesibînin, hîngê gerek e ku Lawê
Xelikan jî wekî faris bê qebûlkin. Çi
heyf e ku kêma çavkanîyên kurmancan
yên bi sera bermekîyan kurmanc bi nav
dikin. Yek ji wan Dr. Ebdulmecît Şexo
ye. Ew di lêkolîna xwe ya ku me qalkirî
da bermekîyan wekî malbat / qebîleye-
ke kurmanc dide nasîn.

Ji bo piştrastkirina vê delîlên din jî
hene. Xwendevanên kovara Bîrnebûnê
jî dizanin, ji eşîra xelikan wekî ku min
li jor jî qal kiriye komeke ne piçûk li
nava Anatolîyê dijine. Nifusa xelikan li
vê herêmê tevhev 15 hezar e û ew li sê
qesaba û çend gundên bi wan va gire-
dayî bi cî û war in. Qesaba û gundên
xelikan yên li vê herêmê bi ser qezayên
bajarê Konyayê, Cihanbeyli û Kuluyê
va ne. Ji qesabayên xelikan ya mezintir
Xelikana Jêrî ye. Ji qebîleyên mezin yên

qesabaya Xelikana Jêrî yek jî bermekîy-
an e (Qebîleyên Xelikan: [www.xelikê-
dondurme.com](http://www.xelikê-
dondurme.com), beşa dîrok). Bi helda-
na nivîskarê Bîrnebûnê û edîtorê mal-
pera xelkedondurme, Ûskê Cimik li
Xelikana Jêrî nêzîkî 100 mal bermekîy-
anî ye. Bi gotinke din li xelikana Jêrî jî
her 7 yan 8 meriya yek bermekîyanî ye.
Bermekîyên vira xwe xelikanî dihesibî-
nin û mîna xelikanîyên din bi kurman-
cî deng dikin.

Di hinek pelikên înternetê
yên navxweyî û herêmî da jî qala
Bermekîyan tê kirin û li ser tarîx û
nasnameya wan û cih û warên ku ew
lê dijîn haydarî tèn pêşkêşkirin û li
ser van mijaran tê mineqeşekirin. Li
gorê haydarîyên di van malperan da jî
aşkere dibe ku bermekîyan kurmanc in
(li gor hinek dîtinan hinek bi kurmancî
hinek jî bi kirmancî/zazakî deng dikin)
û mal û malbatên bermekîyan li hinek
gundên doralîyên Sîverek, Maden,
Amed û Çewaxçûrê belavbûyî bi cih
û war in. (Yasînlek, Lek Koyu ve
Soyunun Tarîhî: [www.sancakkoyu.
com](http://www.sancakkoyu.
com) û Foruma Kurdên Anatolîya
Navîn: www.xelkedondurme.com).
Aşkere ye ku li gorê haydarî û
çavkanîyên ku di vê nivîsê da li ber
çavan hatine rêxistin, bermekîyan bi
eslê xwe ne faris, kurmanc in.

20.09.2008, Mainz - Elmanya

Mîrê Botan û Mîrê Badînan

Jordan

Carekê mîrê Botan û mîrê Badîna bi hev ra şer tajon. Herdu quwetan xwe bi hev anîn ji bo darbeyekî mezin. Navbera wan da şerekî giran qewimi.

Mîrê Botan leşkerên xwe rakir berda ser Badînan. Herdu leşkeran hecûme hevdû kirin. Şerekî, ya mirin ya serkeftin dest pê kir. Erd meşt bû ji laşan û xwîn rijî wek robaran.

Mîrê Botan dît ku leşkerên wî ber vî şikestinê diçê, rabû xwe paş va kişand û revî. Lê Mîrê Badîna bi dû ket ji bo hemû Botanîya qir bikin. Dema ku Mîrê Botan ev dit, sekîni: Li xwe zivirî û gazî li Mîrê Badîna kir. Go: Mîr, ji me vebe û bes e, were pê me. Namûs ew e, mirov havalê xwe bişkîne û şermê bo mîrekî wek te, xelkê şikestî bikalîne.

Dema ku Mîrê Badîna ev gotina bihîst dilê vî şikestî û emir da eskerên xwe ku bisekinin. Û rê da wan, xwe xilas kirin.

NOT: Va nivîsa jorîn min ji pirtûkê *Grammaire Kurde* girt, ji alî L'Abbé Paul BEIDAR (Keşîşê kildanî yê) hatiyê nivisandin. Ev pirtûk di sala 1925 an da li Musilê hatiyê nivisandin.

Keşîşê kildanîyan dibêje li Kurdistanê bi gelemperî sê malbatên kurdên mezin hene. Malbata Botan, Malbata Badîna, Malbata Hakarî. Malbata BOTAN ji Dîyarbekirê heta xabûrê (Siirt, Gêsirah, Mêdêyat û hw...) Malbata Badîna ji xaburê hata Îranê (Zaxo, Amediya, Dehok, Akra û hw...) Malbata Hakarî: Hemû bakûrê Kurdistanê (Şax, Colemêrg, Başkale û hw...)

Keşê keldanîyan dibêje va sê malbatan pir caran bi hevdu ra pevçûn kirine. Ew dibê, îro ji car caran di navbera wan da minekaşa dibe û pir xwîn tê rijandin.

CÎGERXWÎN

Mem Xelîkan

Cigerxwîn di sala 1903 de, gundekî girêdayîyê Merdînê li Hesarê hate dinê. Navê wî yê heq Şêxmûs e. Hê 15-16 salî wû, dê û bavê xwe bi salek navber winda dike. Li cem xwûşk û birayên xwe yên mezin dimîne. Ji wana re rênçberî û şivantîyê dike.

Malbata wî, di sala 1914 an de ji bo ku şerê cîhanê yekemîn dest pê dike, dihere Sûrîyê û li Amûd'ê bi cih dibe.

Cigerxwîn li sala 1920 an ji Sûrîyê radibe dihere Amedê. Ji bo ku biçê ber şêx û melan bixwîne. Ew xwendina 15 salî di 8 salan de, li sala 1928 an diqedîne. Dema feqîtiyê, Cigerxwîn li herçar perçên Kurdistanê digere û rewza gelê kurd, baş nas dike.

Di sala 1928 an de, dest bi nivîsandina helbestan dike. Di sala 1925 an de tev li serhildana Şêx Seîd dibe. Piştî têkçûyîna serhildana Şêx Seîd, carek din bi ronakbîr û welatparêzên kurdan ve derbasî Sûrîyê dibe. Ewana, di sala 1937 de, bi navê Xoybûn komeleyekê ava dikin.

Şêxmûs jî tevî vê komelê dibe û di kovara Hawarê de bi navê Cigerxwîn şîer di-visîne. Ew helbest li dijî zilm û zorê bûn û bi kela welatparezî tijî bûn. Bona wê, navê Cigerxwîn di demeke kurt de, li herçar perçên Kurdistanê tê bihîstin.

Di sala 1949 an de, Cigerxwîn dibe hevalê komûnîstan. Di sala 1950 de, li Kurdistana Sûrîyê Partî Demokratî Kurd ava dibe. Cigerxwîn jî dikeve vê partîyê û hetanî mirinê jî endamê wê bû. Di sala 1961 an de dema şorişa Kurdistana başûr dest pê kir derbasî wira dibe û alîkarîya serhildana, Mille Mistefa Berzanî dike. Li Akedemî ya kurdî ya Bexdayê dersên ziman û edebî dide xortên kurdan.

Dema ku Serhildana başûr têkçû, nûva vegeerî Sûrîyê. Sala 1973 an ji ber stemkârîya Sûrîyê, Cigerxwîn dihere Lûbnanê. Hetanî sala 1975 an, li wir dimîne û di-wana xwe ya sisiyan "*Kî me Ez*" li Beyrûdê çap dike.

Mamosteyê zimanê kurdî, yê mezin li hember kolonyalîstîyê wû û dostê aştîxwaza wû. Di helbesta xwe de;

*"Kî me ez?
Kurdê serfiraz
Dijminê dijmin
Dostê aşitîxwaz
Ez xwaş mirov im
Ne hirç ne hov im
Lê çi bikim bê şer
Dijmin naçî der
Bav û kalê min
Dijîn tev serbest
Naxwazim bijîm
Ta ebed bindest
Kîme ez?"*

Ew çiqas xwaş anîyê ziman.

Êşa, Kurdistanana bindest, derd û kulên netawayê kurd ew cîger bi xwîn kiri wû. Nalîna welatê wî, nalîna Kurdistanana delal, qet ji bîra wî dervediket. Derd û kulên welatê wî, li ser milên wî barekî giran wû. Di helbestên xwe de ew tînan ziman ku gelê xwe şiyar bike. Rewşa Kurdistanê bi çarîna

*"Nalînek tê gubê min, lê wînda û nihane.
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dixan e
Barek da ser milê min lê barekî giran e
da ne serhev kulê min hemî derd û bela ne" tîna zîman.*

Helbestvanê nemir, şairê bê welat, bi xebat û helbestên xwe di demek kurt de di nav şairên dinê de cihê xwe girt û bû helbestvanekî navnetevî. Wî ne tenê bi derd û kulên kurd û Kurdistanê, bi êş û pirsgirêkên her gelekî li ser dinê re dil û serê xwe êşand û ji bo wana xebat kir. Di helbesta xwe ya bi navê "Heval Pol Robson" de digot:

*"Ey heval Robson!
Ne tenê reşik ketin bindestan
Em jî spî ne mane perîşan
Reben, belengaz, bindest çarereş
Birçî û tazî tev jar û nexwaş
Gunê me çi ye ne sûc ne sebeb*

Ketin bin destan ev kurd û ereb
Zencî û hindî em hemî însan
Kê em hiştine wisa perîşan
Nizam nizam...”

Û bi ronakbîri û helbestvanîya xwe ya navnetewî, xwe da nasandin.

Cigerxwîn, jîyanek bi rûmet jîya. Meriv dikare bêje, qet tu pîrsgirêkên li ser dinê û pîrsgirêkên kurd û Kurdistanê wî li ser helbest nenivîsandî tunen. Di helbestên xwe de, tim û tim dixwast gelê xwe şîyar bike. Hîs û fikirên xwe, bi zîmanê kurdî wiqas xweş tînan zîman ku zîmanê kurdî ji nû va diafirand. Li hember axa û bega, li hember olperesta gelê xwe bi helbestên xwe dixwast şîyar bike. Ji bo wê digot;

”Şêx ne dilxwazê te ye lê rênçberê navê xwe ye”

Dîsa:

”Ew bi xwe parsê dike kêngê xwedê gotiye”

Cigerxwîn li hember axa û began jî xebat kir. Wî dizanî ji wana tu xêr nayê gelê wî û welatê wî, yê wek keçikek zend bi bazing.

Dexwazê wî;

”Di nav me de, ne beg mayî,

Ne axa ye, ne paşa ye.

Xwedî kar û xebat wûn”

digot;

”Çilo win dibêjin ”Belê ez xulam”

Wîlo ew dibêjin li nik qeymeqam

Bes e zû şîyar be tu guh mede began

Metirse ji dengê teba û segan”

Cigerxwîn di jîyana xwe de bo kurd û Kurdistanê bêwestan şuxulî. Ew, ewled û helbestvan û zîmanzanekî gelê xwe yî hêja ye. Lê kurd û Kurdistanê ji gelek qedra wî zanî û ji heslbestên wî hunermendên kurdan gelek sitran çêkirin û gelê kurd hê guhdarê wana ye û bi wana şa ye.

Mamosteyê mezin, di jîyana xwe de wekhevî ya jin û mêran yek dizanî. Ew fikira xwe di helbestan xwe ya li ser seroka sedleşkerên Kurdistanê Başûr, Leyla Qasim

”Şêr şêr e, mêr e yan jin e

Nîşan bi dest, Leyla min e

Polayê dil wek hesin e

Leyla kî ye
Leyla jin e
Leyla min e

Leyla min e” anî bû ziman. Ewledê kurd û Kurdistanê yê mezin, yê nemir, mamosteyê zimanê kurdî yê hêja, helbestvanê navnetevî û bêwelat, di jiyana xwe de gelek xebatên giranbiha dan. Di helbesta xwe ya bi navê ”De bigere li ser tac û sera”

de bi rêzên;

”Ey dil li qiraxa çemê Amed rûne sergerdan
Rind çavên xwe veke temaşe ke welatê kurdan
Li alîkî tac û teylesan bêxwedî ne
Li alîkî kalosên kevej ketine bin lingan
Ji berîka xwe desmalekê derxe û çavên xwe paqij ke,
ji wan hêstirên xwe wek tav û baran” rewşa Kurdistanê anî berçavan.

Cigerxwîn li her pêvajoyek jîyanê hebû. Di şer de, li aşitîyê li cemi kedkeran, di hîs û ramanên jîyanê de li evînê jî hewû. Ji yarek delal re digot;

”Wextê seher rabit ji xew, biskan li ser dêman veke
Neynik li ser masa sedef zilf û gire bendan şeke
Çente bi dest te spî zêrbazinan ceng û şer in.
Dakev ji nav Birca Belek nazdariya dîsa meke”

Hosteyê bêmirin, di sala 1979 an de derbasî Swêdê bû jîyan û berxwedana xwe ya dawî li Stockholmê domand. Dema hatî Stockholmê 76 salî wû û berhemên xwe yên dawî yê li wir çap kirin.

Berhemên wî:

Helbest:

- Dîwana yekem: *Prîsk û Pêti* 1945 Şam
- Dîwana diwem: *Sewra Azadî* 1954 Şam
- Dîwana sêyem: *Kî me Ez* 1973 Bêyrûd
- Dîwana çarem: *Ronak* 1980 Stockholm
- Dîwana pêncem: *Zend-Avesta* 1981 Stockholm
- Dîwana şeşem: *Şefeq* 1982 Stockholm
- Dîwana heftem: *Hêvî* 1982 Stockholm

Berhemên wî yên ji bo çand û zimên;

– *Destûra zîmanê Kurdî* 1961 Bexda

– *Ferheng, perçe yekem*: 1962 Bexda

– *Ferheng, perçe duwem*: 1962 Bexda

– *Tarîxa Kurdistan*: (3 cild in 1985-1987 Stockholm dû mirina wî hat çap kirin)

Helbestvanê Kurd û Kurdistanê û yê nawnetevî li 81 salî ya xwe li Stockholmê, di sala 1984 an de çû ser heqîya xwe.

Digot;

*"Ax birano ez nexwaş im nexwaşê welatê xwe
Derdê min jana zirav e serxwebûn derman
Ez ê bimrim bi vê êşê her ev e dexwaza min
Tenoşeyê min çêkin ji textê ber darê zindan
Derbasta min çêkin ji darên sêpiyen Amed, hem,
Qerqerê min çêkin ji teylesan û şal û şedan
Dixwazim min bişon bi ava Dicleyê Amed, hem,
Ji ber gulavê li min bireşinin hêstirên keç û bûkan
Eger li min negerin kovar û rojname û tarix
Bila li ser min bigirîn çend Dilşah û Perişan
Maki wê nebêji sed xwezî me bi dilê Cegerxwîn
Ko ez li goristana Amedê carek bibim mêvan"*

Ev, mirovê mezin û zimanzan, helbestvanê Kurda yî navnetewî li Qamişloyê li perçekî welatê wî yî bindest li ser milên sed hezaran bin ax kirin. Xwedê rehma xwe lêke!

Çavkanî:

Dîvanên Cigerxwîn û pêşgotinên wana

Wîkîpedîa Kurd

Antolîjî ya Edebîyata Kurdî (Cilt-1 Mehmed Uzun)

Mezelê Susizê



Dîmenek ji deşta Susizê, kevir û kêlên Mezelê Susizê

Ev navçeyê di vê dîmenê de "Susizê" ye. Xelkên navçe welê bi nav dikin. "Susiz" bi tirkî tê maneya "bêav". Navçeyekî bê av e. Û ev kevir û kêlên di wêne de jî mezelek e. "Mezelê Susizê" dibêjinê, li ser devê rêya gundê Hecîlera û gundê Kelhesen e.

Dema ku meriv ji gundê Hecîlera ber bi jor, ber bi gundê Kelhesen bi erebê bi qasî 6 kîlometreyan biçe, li ser destê çepê, bi gotineke din li aliyê rojava mezelekî kevn û kevn heye. Heta nuha jî kesek baş pê nizane ka ev Mezelê Susizê ji kîjan demê maye, an jî ji kîjan milletî însan di vî mezêlê de çal bûne. Anuha li rojavayê bakurê vî Mezelê Susizê yayleyê Hecîelî û li rojhilatê başûrê wê jî yayleyê Qiçiqirix heye. Ji Mezelê Susizê heta gundê Kelhesen jî bi qasî 8 kîlometreyan rê heye. Balkêşîya mezelan yek jî jê ew e ku berê wan ne ber bi qibleyê ve ne.

Ji bo ku ji rojan rojekê ev Mezelê tarîxî nebe erdekî çandinî û wenda nebe, me xwest em krokîyeke vî Mezelê Susizê bi çend rêza be jî di **Birnebûnê** de bikin mînyatorê dokumenteke cografîk. (Red.)

Li ser cemedê jîyanek

Uskê Cimik

Pîrhevo

Mêvanên Agolê yek bi yek ji malê derketin, dev dan rê û diçûn malên xwe. Hîv li ewro wek gokekê bû, dema ku di televîzyonê de ‘Gune bakiş’ derdiket û raprapên eskeran ku yên li ber bîrdarîya gorê (anitkabîr) xuya dibû digotin ‘êdî nîvê şeve bû’.

Estrîkên li rû ewro çav ji hevdu re qir dikirin. Li rû ewro vîkavîk yên kenî kurikan bû. Agolê serê xwe di taqî paş malê re derxist û bang kir, ‘bi vî çexex mekin vîkêvîk, ew çi mîzkirina we bû, zû werin’. Bangkirina wê kenî wan birrand. Rû ewro mina çarşevêkê şîn bû, tê de moriyên sorik vêdiketin û vedimirîn, destên kurikan di nav estîrkan de dilîstin, yekê digot ‘min girt’ yekî digot min ‘berda.’ Kenî yên wan bêdengî û dîzî di nav estîrkan de pêl pêl belav dibû.

Agolê şerpiya kesikî û bi xîzên zerîkî ê ku li ser dergûşê nixûmandî helanbû, zêrî ku li porî enîya wî ve bi ronîya

lembê endîrikê dibiriqî. Adet bû, ger dergûş lawik be zêrek porî enîyê ve dikirin. Ev zêrî li enîya wî ûda xwengî Agolê Gula Hesê bû. Agolê, du sê perça ji nanî hûr û hişk da ser balgîya dergûşê, paşê ji paşila xwe destmalekê pêçandî derxist, ew jev kir û lê mez kir, di destmalê de deh penzdeh derzî yên dûrinê hebûn û paşê şûn da ew pêçand û kir bin balgîya dergûşê, ev tişt gî dergûşê ji pîrîkan (Pîrhevok) diparizîne. Agolê nûskeki bi sê qoşeyî û reş jî bi nîkekê ve bi hêlike ve pêda kiribû. Hîn li ser wan jî, Agolê kirasê junîyê Fet Rişîkê jî peyda kiribû.

Ew kirasê junîya li gund bi navûdeng û him jî pirozî bû. Her kî kê dergûşa xwe dianî rû dunê diçûn derpêyê junîya Fet Rişîkê dianîn. Gundîyan digot, ‘Zivistan bûye, li derva bilindbûna berfê ji bejna xaniyan bostek derbas bûye, li paş malan hewthewta kuçîkan, hîrhîra hespan, zirzira keran bûye. Li

malê Fetê Rişikê kesek tune bûye, wê dergûşa xwe yî deh royî dimijandiye, wê ane, ji nîşka ve keçika xwe yê mezin ketiye hundir û jê re gotiye, “Etika delalê! ka bide dergûşê, ez wê ji te re bimijinim” û bi vê re jî dest avêtiye dergûşa di hembêzî wê de. Fetê Rişik jineke bêtirs bûye, bi xwe bi xwe gotiye, “va ne keçika min e, keçika min li vê zivistanê bi tenê nekeve rê.” Pê ve ew rabûye ser nîngan, wek bûye bayek û xwe avêtiye ser pîrîkê, ew dayîye ber lapên xwe û êpî li wê xistiye, por û dev û lêvên wê ruçkandine û di xwînê de hîştîye, paşê ji nîşka ve pîrîk bûye parîyek nan û ji ber çavan com (wendabûn) bûye, ji wê rokê pê ve pîrîk li mala wan tû caran xuy nebûye.’

Agolê ew kirasê juniya qet ji xwe nedikir û digot, ‘ew li ser min genî û germal bibe jî heta çel royan ez wê ji xwe nekim.’

Çel royên din şûn de êdî pîrîk neye ser dergûşan, ew bawerîya gundiyan bû.

Agolê serê xwe ber ve dergûşê dirêj kir, ew bîhn kir û maçek da enîya wî, pê re jî dergûş venciqî, Agolê got, ‘wee?! ez li dorê! tirsîya?!’ Paşê wê dest dirêj dîwêr kir û lambe ji çirê derxist, ‘hu’ kir hundirî lambê, dûva du sê ca-

ran li der dorên wê jî tû kir û piştê kî-tana li ser serê xwe derxist û pê ew paqij kir. Fîtila çirê bi kîbrîtê vêxist û lambe da şûnê û xwest ku ber ve taqê here ku careke din bangê kurikan bike, di wê radêyê de li neynika li kêlekî lambê çirê xwe dîyîbû û di cî de sekinî û li xwe mez kir. Ew ji neynikê bostek û ji xwe jî du bost dûr xuy dikir.

Ew hîn neketîbû çelî lê sipîtî di nav porên wê de cî girtîbû. Porê xwe yî bi guliyên hûr hûr li ser mîlên xwe berdayî yek bi yek ketibûn rêze, di nav berê her guliyên de morî mircan li hev giredayî bû. Tîliyên wê li ser guliyên re dihat û diçû. Serê wê li ser milekî xwe xahr bû, perçem li hêleke şikestîbû û çavê rastê pê hatîbû girtin. Li ser rûyê wê ne bextewarîyek û ne jî xemek hebû. Nefesek dirêj, sivik û kûr kişand û hedî hedî berda, keser di neynikê de diçû xahrê. Li kêlekî neynikê çekêtekî qehveyî hebû, ew ê mêrî wê bû. Agolê ew her şîva li ser dergûşê dinixumand. Destî xwe li ser wê du sê caran gerand. Mêrî Agolê nêzikî pênc sal in, li welatê Alaman bû, yên ji xeribîyê dihatin û digotin, ‘Me mêrê te li Firansê dîye, henan jî digot li Welatê Swêdê me dîye.’ Mêrî wê du salan an jî pênc salan cike dihat gund û ew mehekê dima

an jî nedima. A herî dijwar jî ewê ku henan digotin, ‘Mêrî te li wir zewicîye.’ Wî bo aboriyê malê ne qeymek û ne jî nameyek ji malê re dişand. Agolê bigota, ‘Ha mêro! te hetê vê çexê bo malê tû tişt nekir, te ji me re va qutîya şand û te pê gundek li ser serê min civand.’ Agolê ji vê televîzyonê re digot ‘qutî’. Agol bo aboriya malê her roj biçûya malan dûrinî bikira, tevn bikira, nan lêbixistiya û li ser çem bi ro bê ro kinc bişûsta. Pê vê cîwanîya xwe, pişt lê xûz bû.

Agolê serê xwe berve çêket dirêj kir, xwast ku bîhn ke, bi qirç qirça dengê derî Agol vencişkî û wekî brûskeke serê xwe berve derî çerx kir û vê re jî guliyên wê li hewa berhev ketin û morî mircan deng dan. Herdû keçîkên xwe û ez, em ketin hundir. Agolê bi dengêkî zîz û bi hirs got, ‘ma mîz kirina we serê we bixwe! zû têkevin nivînên xwe û rakevin!’

Hîn dergûşa Agolê nehatibû dunê wê ji etika min re gotîbû, “Nurê! he-te çel rojan ma va gûhvîtko li cem me be, çir dibe çir nabe, dibe ku pîrîk tê!” Hete çel rojan ez li mala Agolê bûm, digotin ‘li malekê mêrek bibe pîrîk nayê wê malê.’ Min di van çel rojan de bi van çavên xwe pîrîk nedîbû,

min va ji xwe re kar dixisand û pê ve di nav gund de serê min bilind dibû. Lê her sibe Agolê radibû, ji cîranan re îşev çend pîrîk hatin û çûne bi çoşeke mezin qal dikir. Wexta ku Agolê wisa digot, min serê xwe dikir ber xwe û ji fedîya re heft caran diketim binê erdê. Yek caran jî di goşekî kirasê junîyê xwe re digirt û digot ‘va kirasê junîya li ser min tûne bûya pîrîk ê em îşev bixwarîya.’ Ez î xizan! Vi çend kirasê junîya jî tûnebûm.

Agolê niçika pîrîsa endîrkê a li kêlekî derî tilî lê da û lamba endîrkê hat vemirandin û hundirê odê ket bin ronahîya lamba çîrê.

Li kolanên tarî, dirêj û teng ne mîrovek ne jî heyvanek hebû. Li paş mala Agolê, li ser kûlingê (arî) bablîsokek biçûk rabû, li ber hev xwe da, li der dorên xwe zivirî û paşê zîrav bû û li hewa xwe bilind kir. Bayekî sivik di taqê Mala Agolê re xwe avêt hundir, tûlperdeya pencerê hejand. Destekî çaketî ê li ser hêlika dergûşê giran giran heyne. Paşê bi vebûna deriyê odê televîzyon ve helhelek jî di hundir de belav bû û vê re jî bi qirçgir-ça dengê derî ve pisika malê xwe rast kir û bi çavên xwe yê biriqî li derî mez dikir. Hundirê odê niv tarî bû, pêti

yên lamba çirê ê bi diwêr de bi mîxekî kutayîbûyî li ser yêr radiketî re dihat û diçû.

Qeratîyek bi lezûbez ber xanîyê Agolê re derbas bû, minak tu bêjî ew bi dîwêr de xuj dibû, ne tu dizanî ew mêr bû, ne jin û ne jî heywanek bû. Qeratî di goşê malê re çerx bû û ew di nav şevêreşê de com bû.

Dîregî endîrkê li ber malê Agolê bû, ronîya xwe dida xanî. Li ser xanî, bi panîyê wê neyloneki çend derên xwe yî dirî rexistîbû, li her kenarên wê jî kevirên biçûk avitine ser ku ma ew li ber ba nekeve. Lod lod xulî jî avitine ser neylon ku ma li berf û baranê odeyên xanî dilop nekin. Lê dîsa jî her zivistanê her odekê dilop dikir, Agolê êdî legan, teboxên xwarinê, sênî dikirin bin dilopên baranê. Car carnan jî Agol an jî çend kurikan yêr cîranan e helkiştina ser banê bi bêran an jî bi şîşingên (gêzî) berf li ser diavêtin. Dengê şîşîpên dilopan xewek nedida yêr malê.

Di bin qamişên sêz yêr rexistî de, serê yêr darên qalind yêr geliştî hen dirêj bûn, hen jî di nav qamiş û kerpîçan de bi zorî xuy dikirin. Di navberê her darekê de nêzikî bostek hebû, di bin her darê de jî hêlînên

çûkan û dûmeqeskan lê hebûn.

Li diwêr, ji jor de heta dawîyê qelişîyek lê hebû, ew mîna birînekê kur lê xuy dikir. Çend rojên ber ve, çend xortên gund li diwêr bi kîrêça sîpî 'Bijî Kurdîstan' nivîsandibûn. Qelişt ew nivîsa bi du alîya kirîbû; Bijî kurd û îstan.

Bi hatina ba û bi barîna barane ve xulî li derdorên keviran yêr temelê xanî dicivî, bo ve xaniyê Agolê her sal bostek di erdê re diçû xahrê.

Qeratîya bêdeng û bêreç di nav şevêreşê de derket, ew ber ve derî yê xanî çû û ew ket hundirî malê. Sîha wê li diwarî odeyê Agol raketî de xuy bû, pîyên wê ji xwe dirêj bûn, porê li serê wê mîna şîşingên sêz lê çik bûn. Ew piçekî li ber hêlikê dawestîya û dûva wê du sê caran hêlik hêjand.

Agol di xeweke kûr da bû, porê xwe yê reş û spî li ser balîva serî gij bû. Ronîyê lamba çirê hêleke rûyê wê sor dikir, hêla din jî di şevêreşê de bû. Kirasekî şînî lê bû, ber stûka wê bi çar morîyan bû, her çar jî lê girêdayîbû. Agolê di ber xwe de giran giran dikir pilêpil û kanikên çavên wê lê dilistin. Sîyek li ser Agolê xoy bû, destekê du-sê caran hute pîyê Agolê kir, Agolê çavên xwe vekir, ew çi bibîne!!!

Agolê xwe rast kir û bi dengekî şaşmayî ji wê re got, 'Weee Xûngê! ez bi qurban! Tu bi vê çaxê hatî vir çil? Gula Hesê li ser Agolê xwe xahr kirîbû, bi dengekê nerm û hêdî jê re got, 'Gotin derguşa xungê te bûye, Ez li dorê! min go, ez ji te re ûdekê binîm, loma ez bi vê çaxa ketim rê.' Dûra jî wê dest avit paşîla xwe, topek derzî jê derxist û bi lez avêt nav hêlikê û qîjinî bi dergûşê ket.

Agolê çav lê bel bûn, benz lê zer bû. Ew mîna brûskêkê rabû û xwe avêt ser wê û bi porê wê girt û ew da ber xwe, por lê diruçkand, porê wê mîna jûjîyê bû, jê bi tele bi tele divaşî û çar didanên dirêj û tûj di dev de dibiriqîn. Di herdû bêvilên wê re marên biçûk û reş derdiketin, wan xwe li Agolê dipêçandin. Ji pêşîrên li ser mîlên wê xwîn dilop dikir.

Agolê di nav nivînan de xwe diçirpî-nand, di xwû de reş bû, di ber xwe de dikir wexêwex, serî li xwe pît pît dihê-jand.

Bi wexêwexê ez rabûm ser ning-an, bi ronahîya berbangê hundir vekirî bûbû, keçîka xwe biçûk li kelekê nî-

vinê Agolê bû, çeketê bavê xwe lê bû, pê xof xuy dikir, ez jê tirsiyam. Keçîkê ez dîm û vê re jî meşîya, hat cem min, ew dilerizî. Dest û piyên Agolê li hewa dilîstin, êdî wê bi dengekî bilind dikir wexawex. Keçîka xwe din jî ji xewe ra-bû, me her sêyan xwe li hevdû pêçand. Em ji tirsan ji çokan ketin, di cide em rûnîştin.

Ne ji Agolê, ne ji derguşê û ne jî ji me dengê derdiket. Bêdengî mî-na xofekê di odê de çerx dibû. Pêçêke din şûn de ez rabûm, bi min re her dû keçîk jî rabûn û xwe li min pêçan-din. Min lamba endirîkê vexist û em çî bibinîn!!! Hêlik vala bû, Agolê li ser nivînên xwe yên gîj bû û ew bi çokan ketibû erdê, serê xwe li erdê bû û li ser nivînên wê zêrê dergûşê dibirigî.

Berbang bû, roj hema hema li der- ketinê bû. Hestirka sibê li jor Gomê Hecê Qomê xwe dilivand. Ji dûr de, dengê fîrîskên şivanan, yên pez û yên kûçikan li ber hev didan. Ji hêla gund de jî dengê Serkan mina qemçiyekê li ser ga diket. Naxir di nav toz û dumên de li ser pira Hesênê Qedê re derbas dibû.

bakî hênik hênik
pêl û pêl tê
avên kişiyane
gogircîyê xuya nekir
sîyên darên bî daketîye ser çêm
masîyekî li nav avê li hêlina xwe digere
fîratî zelal û zelal diherike
kepirike avê ê konî xwe dadigirê
ez î li keviya fîrat im
serê min î li ber rojê
lingên min î di nav ava şîrgerm da ne
ez ji qedehî vala î li ser masê hez nekim
sîdurî
tu li ku mayî
berde ma here
ma jîyanê dewlemend
bersivên zêde bike
wa janan ancax
hêvîyeke mezin
û felsefeke kûr
sivik bike
sîdurî
derdê me jî bes ne awê
tiştê ku tu bikî rê nîşanê wî bide
ma ew here lêbigere
lêgerîn î rind e
da ware
xwe bi kêleka min de
û ji min re qala hersê tiştan bike

seyfi dogan

QENERE

Seyfî Dogan

Hevalê min, dostê min û pixaltîyê min î delal Mem Xelikan di hejmara Bîrnebûnê ya 30î da qalê kuçikî Hesî Colo dîke. Hêkateke xwaş e. Kuçikî Hesê Colo î qenere ye.

